



Ekolojî 01: Çandina daran a demdirêj li ser rêkan

Jîyanên darên li ser rêkan tên çandin zehmet e li gor darên li nav baxçan û hêran tên çandin. Ji ber wê gerek e mera kortikên darên li ser rêka tên çandin bi awakî amede bikê, ku jîyana wan daran çêtir bibê.

Kortika qurmê darê, ya ku bi axeke nû û baş tev zibil were dagirtin, divê têra xwe mezin be, da ku 5 an 10 salên din jî têra qurmê darê bike û bikaribe rind ava baranê vexwê. Loma divê dorhêla darê ji bo parka seyareyan netê bikaranîn, ji aliyê makîneyên giran nedewise û netê betonkirin, da ku tamarên darê hişk û pûç nebin.

Gava mirov darekê diçîne, pê re du borî avdanê jî ji binê axê digihîne dorhêla rehên darê. Wisa mirov dikare yekser tamarên darê av bide û gava hewa gelek germ be jî ava avdanê kêr dibe buxar. Divê serê jorîn ê van borîyan bi qapaq be, da ku ji ber zibale û qirêjiyê borîyê nexitim. Gava mirov çembereke avdanê li ciyekî bilind li jora kortika qurmê darê saz bike, hingê av di nav çoltika qurmê darê de dimîne.

